KEÇA BEDEW

Demhat Hezexî

Hey stêra ronîbar
Navê te
Ketiye dergûşa dil
Kî dikare rake
Ji rûpela cîhana min?
Navê te
Li bîra mine
Kî dikare dûr bike
Ji xewn û xeyalên min?
Mane navê te

Bi dilopê hêsran hatiye kolan...
Mane navê te
Bi serê derziya koh
Hatiye neqiş kirin
Kî dibêje ezê rakim?
Na!
Kes nikare rake
Navê pîroz
Navê evîna min û te
Hey keça bedew...